



SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Dûrzan Cîrano
Eşref Bolumcu
Ferhad Aslan
Helbest Çetîn
Mazlûm Sîyabend
Orhan Tanhan
Selmet Guler
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan
Bitlisakademi

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉
folklorame 🐦 📷 📘

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 1

Hejmar: 4

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevînc Adiyaman

Wêneyê bergê pêş: Orhan Tanhan

Wêneyê bergê paş: Mazlûm Sîyabend

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Őti.

Orta Mah.Fatin Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919

Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Lorîyên Qelqelîyê-1, **Mehmet Yildirimçakar**
- 10 Aykê, **Helbest Çetîn**
- 12 Navnûçikên jin û mêran li Meletîyê, **Mahîr Ugur**
- 14 Efsaneya Çala Hakloyê, **Elîf Gun**
- 16 Hespên koçerên Botanê, **Dildar Botî**
- 22 Demenic û pîr, **Ugur Sermîyan**
- 23 Mihemed Yeman û Pelikman, **Lokman Kalan**
- 34 Ferhengoka Agirîyê-2, **Firat Keklîk**
- 36 Mêyik û he sê kosebêyak, **Hikmet Yıldız**
- 43 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 44 Meseleya paşê, **Simko Sonmez**
- 48 Lîstikên zarokan li gundê Qazîyê-2, **Yaşar Eroglû**
- 50 Xoceyo zûrker, **Veysî Arcagok**
- 52 Nav û taybetîyên hin cureyên gîyayî li Mêrdînê-2, **Mem Mukrîyanî**
- 56 Xecê Qutkê, **Vildan Sevîm**
- 62 Ji Pasûrê çengek mamik, **Elîf Gunduz**
- 64 Kilamên nexweşan, **Cemîl Çelîk**
- 66 Efsane ser o çend malumatî û Efsaneya Kekoyî yan zî Pepûke, **Surya Human**
- 68 Rola jinê di destanên kurdî yên epîk da, **Ahmet Seyarî**
- 80 Du meselokên Farqînê, **Roza Sîerra**
- 82 Hin biwêjên Devera Kercewsê, **Hejar Dilbirîn-Yakûp Çelîk**
- 86 Mêvan, **Mihemed Selîm Selîmxan**
- 88 Hin nexweşî û dermanên nexweşîyan li gundê Çîçîka, **Bêrîvan Matyar**
- 90 Qatqatîk, **Xecê Bîşeng**
- 103 Nifrîn di heyranokan da, **Cemîl Şelazî**

Ji edîtorî

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibare li hazir û guhdaran. De hûn dizanin gelek çîrok wisa dest pê dikin û dirêj dibin û dibin û dibin heta zarok dikevin xewê û xewnan dibînin. Di xewna xwe da heft qat diherin binê erdî, carna jî bilind dibin heta heft tebeqeyên ezmanî. Di xewnê da rûçikê wan zarokan dikene, û ew dilşad in; em jî îro bi qasî wan zarokan kêfxweş û şad in, çimkî me karî careka din em bên ber derîyê we.

Li gel derxistina kovarê, tiştê din yê ku em pê şanaz û serbilind in, eleqeya we ya ji bo kovara me ye. Hûn hem bi nivîsên xwe hem jî bi pêşnîyar û rexneyên xwe hêzê didin me. Mala we tevan ava be. Bi taybetî girtîyên zîندان, bi name û nivîsên xwe yê hêja coş û kelecana me zêde dikin. Bi xêr di hejmarên bê da, dê nivîsên wan jî bên weşandin di kovara me da.

Folklor Me, hejmara çarem dîsa têr û tijî ye. Berhevkarîyên ji beşên cuda yê folklorê û binbeşên wan, gotarên curbicur, xaçepirsa folklorê, ferhengoka peyvan û hevpeyvîn; me kovara xwe bi van xebatan dagirt. Helbet tiştê ku kêfa we dê jê ra bê heye di kovarê da, loma jî xwe nexesirînin; xwe û malîyên xwe bê “Folklor Me” nehêlin.

Berhevkarê hêja Mehmet Yildirimçakarî Lorîyên Qelqelîyê berhev kirine. Ji bo dayîk û nifşên kurdevar ev cure zehf giring e loma jî divê her kurd di tanga xwe ra vê keresteyê û kerseteyên din berhev bike û biparêze. Ahmet Seyarî berê xwe daye destanên kurdî û ew li ser rol û karîgerîya jinê di destanên kurdî yê epîk da, hûr bûye. Cemîl Şêlazî, di gotara xwe ya bi herfên aramî da, berê me dide bikaranîna nifiran di heyranokan da. Mem Mukrîyanî dîsa ji beşeka cuda deng li me dike, yek bi yek qala gîyayan dike. “Aykê”ya mirovxur, “Xecê”ya ku ji ber karî bûye wekî pîrikekî, jinbava zalim, pepûk, mêvanê fama û sê birayên kose; hin leheng û tîpên hejmara me ya çarem in.

Di vê hejmarê da hin berhevkarên me yê ciwan hene ku mirov çav li xebatên wan dike, mirov hem kêfxweş dibe hem jî bextewar: Elîf Gun, Simko Sonmez, Helbest Çetîn, Hîkmet Yildiz û Vîldan Sevîm, em wekî Folklor Me, we pîroz dikin û dibêjin “rêya we vekirî be û hûn her serkeftî bin.”

13ê Kanûna Paşîn, zarok û xortên gund û taxan dê xwe bikin dilqên cuda, bên berîyê we stranan bibêjin û bilîzin. Ji kerema xwe dengên wan nebirin û bila ew bibêjin;

Serê salê

Binê salê

[Xwedê azadî û serbestîyê bike qismetê vê malê]

Û hûn jî bibêjin, “amîn.”

De bi xatirê we gidîno! Lê hay ji xwe hebin ku bila kose we neşelînin, zîya we nexwin, jinbav jehrê nekin nava xwarina we, xoceyên zûrker zarokên we nedizin, xelk û alem jî nebe qesasê evîna we.


Eşref Keydanî



Lorîyên⁽¹⁾ QELQELÎYÊ 1

Mehmet Yildirimçakar *



*Xwendekarê doktorayê, li
Zanîngeha Çewlîgê (Bingol)
Beşa Zîman û Edebîyata Kurdî.  Ferhad Aslan

Navnûçikên jin û mêran

li Meletîyê



Ferhad Aslan

Navnûçikên jinan

Mahîr Ugur

Berhevkar: Mahîr Ugur
Herêm: Arxa, Çirmiktî,
Wêranşar, Darende/
Meletî
Dîroka berhevkerinê:
Tîrmeh/2019

Aftir
Alganî
Başşê
Battê
Çîzzê
Çollê
Çomê
Çortê
Davşilê
Delgûr
Dînê
Dizzê
Findê
Forqê
Gavrê
Gavrik

Gildik
Gûrê
Habbik
Habpê
Hirtê
Jûjê
Kartê
Kûllor
Nermê
Nêrmik
Panê
Parrê
Patê
Pirtê
Pîzzê
Qijjê

Qirşê
Qobbê
Qûşşê
Raşşê
Raşşik
Rîçê
Rixê
Rûttê
Sarê
Sindê
Sistê
Şaşê
Şillê
Şûnnê
Tartê
Tirkê

Tûjjê
Virrê
Vittê
Vizzê
Xirtê
Xofê
Xofik
Zalê
Zanê
Zarê
Zirtê
Zomê
Zorê

Hespên

KOÇERÊN BOTANÊ

Kihêla kawreş qahîm e, tu car şek nadin, ango nafîsên. Kurda bêhtir timahya kihêlê dikiran. Kihêl yê rîyê dûr û şeran bûn. Kihêl divê di carigê de neyê sekinandin, tewlik du tewl bê avêjtin da nefesa wan sar bibe. Hespê kawê wan spî bin zû diwestin, zêdetir şek didin, yanî cih derdikevin. Hespê kihêl dizane siwarê wî ji wî çî dixwanze, di nava wî û siwarê wî de girêdanek ecêb heye û dewarek xweyî bext e.

Dildar Botî



Mihemed Yeman û Pelikman

Lokman Kalan

“Wela zihak di serê kanya me de ya. Em bê av in. He’ro keçikek wê xwa edilênê wû ê, wê xwa zer kîyê û wê qurpênê. Û ew ava’d bera hat îca wê xelk ê’j xwa ra ênê. Ê go gihayê gihayê. Ê negihayê, tina.”

Dibê:

“Ez ê wî marî kujim. Wera, ti wera wû e jî ez ê êm. Wextê go tilya xwa halo bika, go wextê xwa zerkê tilya ta’şxwa ê te qurpênê. E jî ez ê ewkê...”

Şûrî pê re ya.

“Ez ê vî şûrî xima devê wî û ez ê wî kujim.”

Ferhengoka Agirîyê

Firat Keklîk

Afte:

n. z.>m.

Haydarîya bi tişteki.

Mînak: Wê afteyê jî Mîsto dixê devê wan, wekî din ev tişt nedihate hişê wan.

Alode/Arode:

r. z.>nt.

Kesên bêkar û bêkêr diçin û tên.

Mînak: Ev kurê min mirovekî alode ye.

Bomedêran:

n. z.>m.

Gîyayek e. Dermanê dilêşê, navçûyînê.

Mînak: Heke li cem me nava yekî biçê bomadêranê didine wî kesî.

Cêlet:

n. z.>m.

Terz, qayîde, teher, awa.

Mînak: Bi vê cêletê kar nayên kirin.

Devhewle:

r. z.>nt.

Kesên zarxweş, xweyî xebardana xweş.

Mînak: Ma dawîya kesên devhewle tê.



Zarbêj: Sînem Keklîk



çemekê da.”

He du bêyakên dî jî gotin:

“Tu mezinê me yî, tu çi bêjî em ê wesa biken.”

Û *mêyik* dane pêşîya xwe û çûne çolê. *He sê bêyakan* hindek pûşpelaş²⁹ û *daik* xir *kiin*. Belê hindî çi diken ew pûşpelaş û *daik* hilnabin.³⁰ Tu nebêje *baanek* hatîye û hemî ter bîne. *Bêyakê* mezin got:

“Em wi *mêyikê gêê* bidene *dayeke* mezin, bila *lêye*³¹ bit û em jî biçne gundê henê hindek neftê peyda biken. Paşê em ê bên û *agiyê* xwe hilken û wi *mêyikê* bisojin.”

29 pûşpelaş: qirş û gîyayên hişkbûyî.

30 hilnabin: agir pênakeve, vênakeve.

31 lêye: lêre, li wir.

He sê bêyakêt hîlebaz rabîn *mêyik dayê* we *gêê* dan û çûn ca neftê bînin. *Mêyikê see dayan*, dilê xwe da digot, ya Rebbî, ez ê çawa xwe xilas bikem, tu rêkekê bo min weke. Gelek *debas* nebî ku *mêyiki* dît ku şîwanek dîha diket. Zû hîleyek hate *bîya* wî û pê dengeke bilint *kîi* qêrîn û got:

“Wilah min newêt, bilah min newêt. Belaya xwe min weken, Xudê min newêt.”

Şîwanê reben dengê wi bihîst û hate lalê wi û gotê:


“Babo te *xêy e* tu bo çi dikey qêrîn, ew çi *hewaa* te ye wesa?”

Mêyiki got:

“Şîwano hema huş be. Ez ketime belayekê. Axayê gundê henê dibêjete min ilah tu dê

Xaçepirsa folklorê

Oktay Altûn



Ji bo bersivan
li rûpela 104ê
binêrin.

1. Mîrekî navdar yê bajarê Cizîra Botanê ye, kalikê Mîr Celadet Elî Bedirxanî ye. **2.** Civat û sohbeta şevê ya ku tê da carinan kilam û lîstîk jî hene. **3.** Kevirekî mezin û girover, ji bo dewisandina axa ser banê xanîyan tê bikaranîn; lox, bangeran. **4.** Tenekeyekî biçûk e û bi wî av ji çalê tê kişandin. **5.** Dengbêjê kurdan yê herî navdar e, jê ra “Homerosê Kurdan” jî tê gotin. **6.** Amûrekî mîna tevşoyî ye û ji bo kolîna erdî tê bikaranîn, ji bo navê vî karî jî tê bikaranîn, ...kirin. **7.** Li Dîyarbekirê di nava çanda denbêjîyê da mezin bûye, ew jî bi xwe dengbêj e, stranên kurdî-tirkî jî gotine, sala 1996an li Îzmîrê çûye rehmêtê.. **8.** Selikeka mezin e, serdev tê qulibandîn, mast û xwarin li binî tînen hilanîn/parastin; sepeta pîrikan. **9.** Malbat, ji bo zewacê keçên xwe bi hevdu ra diguherînîn, pêguhertî. **10.** Kesê ku li bilûrê dide. **11.** Cureyeka strana kurdî ya

gelêrî, kurt û evînî ne. **12.** Genimê hêrayî, ar. **13.** Heftrenga piştî baranê, keskesor, qozeqer, heftreng. **14.** Çîyayekî herêma Behdînanê ye û nişteciyên derdora wê kurdên êzidî ne, wilo tê bawerkirin ku pirtûka pîroz ya êzidiyan di nava vî çîyayî da ye. **15.** Di 21ê Adarê da tê pîrozkirin, destpêka biharê ye. **16.** Hesinek e û dikin stûyê ajalan da ku deng derbixe. **17.** Di bin erdê da cihê hênik e û tiştên wekî goşt an jî penêr ji bo xera nebin li vir tînen parastin. **18.** Bajarekî kurdan yê dîrokî ye û piranî bi peyva “Botan”ê ra tê bikaranîn. **19.** Xwarineka ji çend sewzeyan tê çêkirin, piranî li ber vê xwarinê girar yan jî birincê tê çêkirin û ev xwarin di nava kurdan da gelekî belavbûyî ye. **20.** Qumaşekî zirav û tenik e, jin pê porê xwe digirin/dipêçin û bi taybetî spî ye, ji bo sekinandina/xelaskirina şer û pevçûnê jî dihat bikaranîn; kitan, laçik.



Meseleya paşê

Simko Sonmez



Zarbêj: Xecê Kîper

Teyr rakir jê ra bir.
Jê ra bir. Ê paşakî
dîn bihîst ku kurê
filan paşayî zewicî-
ye. Wî jî jê ra gur-
lak cewerdaş bir.
Cewerdaş bir. Pir ma
hindik ma, ê ne go
zar jê (ji bûkê) pey-
da nebûn. Vî go ez
çito bikim? Go ez ê
bizewicim. Çû yeke
eşîreke din, yeke reş
e, ha bêvil e, waê!
Wî xwest anî hat, kir
hêwi. Bû di jina. Ku
bû di jina, anî hat.





Yaşar Eroglu

Lîstikên zarokan li gundê Qazîyê

2

Ferhengok

Dilq: Teşe, şikil.

Qirşik: Darikê piçûk yê kêrnehatî.

Çilpî: Şitlê darên dehlan.

Çaw: Gîyayê honayî.

Potik: Pîneyê diryayî, pîneyê kêrnehatî.

Laçik: Ji bo nixumandina porî tiştê ku jinên ciwan û mezin li serê xwe dialînin.



Xoceyo Zûrker

Veysî Arcagok



Cayk ben cayk nêben, yow keynek bena.
Keyna rocîk şina ders quron gêna, waxti k'
kê xocî ra vecêna teber, quron xo xo vîr a
kena. Vona:

“Ez tepa agêro, şêro bîyaro.”

Senî k' ber akena şina zere, ownêna yow
dest dirakerde ha fek xocî da, ca d' tepa agê-
rena yena kîye.

Roca bîn xoce von:

“Sedîxa ti qey omeya, ti qey tepa agêraya
şîya?”

Keyna vona:

“Ney xoce, ez ne omeyo, ne agêrîyayo.”

Xoce ownên, ken-nêken keyna ti ra nêvona.
Dima ena keyna bena pîl, zewecêna, lacê pa-
şayî gêna, yow lac ona. En xoce şin ya het a,
selpest xo d' ben, sawen deston ya ra, fek ya
ra o lac ya gên ben. Vistirî o mêrdey keyna
yên zere, ownên lac nêasên. Fek ya o deston
keynek gûn ey, lac paşayî von:

“To lac werdî.”

Ena keynek reyna nêweş bena, yowna lac
ona, xoce reyna yen, sey raya bîn, pê selpest
gûn sawen fek ya ra. Ay lac zî gên şin. Reyna
mêrde ya yen ownên gûn ha fek ya ra ya,
von:

“To en lac zî werdî.”

Nav û
taybetîyên
Mem Mukriyanî

hin cureyên gîyayî
li Mêrdînê 2

Hêrû

Navê Gîyayî	Qam (cm)	Firehbûn (cm)	Kulîlk	Rengê kulîlkê	Cihê lê şîn tê	Dema şînbûnê
Kerenga Fatma Nebîyan	10-30 cm	10-40 cm	Heye	-	Qeraç, beyar	Bihar
Zeloqanik	20-90 cm	7-15 cm	Heye	Spî	Erdên çandî, piştekan	Bihar
Xîyarok	10-80 cm	5-25 cm	Heye	Şîn	Erdên çandî, beyar	Bihar
Şeqîqe-Gîhakê Bûk û Zavê	15-40 cm	10-30 cm	Heye	Sor-Spî	Erdên çandî, şûv, beyar	Bihar
Istrîterik	20-60 cm	10-40 cm	Heye	Morê vekirî	Beyar, qeraç, piştekan	Bihar, payîz
Qinêber	7-30 cm	5-20 cm	Heye	Spî	Erdên çandî, tixûb	Bihar
Hêrû	50-150 cm	20-45 cm	Heye	Spî, helesor, şîne	Erdên çandî, qeraç, beyar	Bihar
Gonî	10-30 cm	20-50 cm	Heye	Qahweyê zere	Qeraç	Bihar

Xecê Qutkê



Paşî jî xwe re wusa
dinêre wa kêzîkek bi
diwar ve diçe, tiştêk
dikeve bita wê. Bi
kelogiri li kêrêkê dinêre
dibê:

"Hahûû,"

Zilam dibê:

"Çi hû?"

Dibê:

"Ma ne ev xaltiyênim -Xecê
Qutkê bû, ew jî weke
min hingî li kêr û kêr-û
kêr hû kêzêka res. Fu
wele ev xaltiya min e bi
diwar ve diçe."

Vîldan Sevîm



Ji Pasûrê çengek mamik




 Helbest Çetîn

Elîf Gunduz

- 1) Bin textik e ne dar e, çilo dixwe ne kar e.
- 2) Kîskê sorî tije morî.
- 3) Ga serê çîya diore, çêlek li newalê diore.
- 4) Kîsik serî, hat ber derî.
- 5) Ga di bin bar da, bar bin dîwar da.
- 6) Kalo tê ji deştê milik dirî li piştê.
- 7) Ji şeker şîrintir e, ji hesin girantir e.
- 8) Qol demançe, piştta baxçe.
- 9) Sazê destê însana, ne li erdê ne li esmana.
- 10) Zilo zilo zîwano, mîr hakimo dîwano.
- 11) Ne'l erd e ne'l esman e, hêlîna betrewan e.
- 12) Çardim çilêlim, pêncim pilêlim, bin da xilêlim.
- 13) Pûrto pûrto pûrt tine, xwarin heye gû tine, îyar heye mû tine.
- 14) Tiştik min heye di heft mila da diqelive.
- 15) Di qul tarî, di qul renî, di rêz morî, di merê reş meydanka fire.
- 16) Tiştto ne tiştto, hestî li piştto.
- 17) Hilindir milindir, kur ji bavê bilintir.
- 18) Ji qurs heya qurs, here mala bavê qurs.
- 19) Lûvo digrî, bûvo aş dike.
- 20) Rêça gakî li mezzakî.
- 21) Nêrîyê dûzer, bizina kember.
- 22) Diçim delkî, pîyê min dikeve îyarkî.
- 23) Bi ro bûk e, bi şev pepûk e.
- 24) Dara nava avê, sih û sê gulî ji xwe davê, her hêlînik hêkik, lê her hêkik navik lê.
- 25) Serî di zikê te da, nav di ê kerê da, binî di erdê da.
- 26) Diçim nava delkî, qêrîna merkî lê dixim gopalkî, deng diçe hezarkî.
- 27) Xatîya narê, da berwarê.
- 28) Giloka xezalê, gêrbû newalê.
- 29) Zinokê pişvenokê.
- 30) Ser telîno, bin darîno, nav şîrîno.

Cemîl Çelîk ▶



Kilamên nexweşan

Ne hewce ye ku em qala xurtbûna dengbêjîyê bikin. Lewra bi serê xwe şêwe û formeka zehf xurt e. Dikare di nava xwe da bûyerekê bi-hewîne yan jî qala rewşekê bike. Hinek caran ne hewce ye ku bûyer û rewşeka qenc yan jî xerab hebe. Azar û êş, şîret û pend, kêfxweşî û şahî, betalî û mijûlî; mirov dikare bibêje di her rewşê da bi awayekî serkeftî tê gotin.

Dengbêjî di nava xwe da gelek cureyan di-hewîne. Gelek caran dikeve nava çîrokekê û di beşeka girîng ya çîrokê da (şer, dîyalog, êş) alîkarî-ya çîrokê dike. Xeynî van, cureyên dengbêjîyê gelek in. Her cure bala mirov dikişîne ser xaleka cuda. Di nava cureyan da xeteka pir zirav heye ku wan jî hev cuda dike. Pîranî kilam jî naverokê yan jî ji meseleya kilamê navê xwe digire. Ser meselê kilamên firaran, kilamên dilan, kilamên şeran, kilamên keçan/qîzan... Bawer dikim ku lêkolîn bên kirin dê gelek cureyên din yên kilaman derkevin ser rûyê erdî.



Efsane ser o çend
malumatî û

Efsaneyaya Kekoyî yan zî Pepûke

Surya Human



Efsane mîyanê edebîyatê şarî yê anonîmî de ca girewto, bi fekan ameya vatiş û resaya na merhale. Çekuya efsane mîyanê şaranê bînan de no tewir name girewto: Erebkî “ustûre” (zh. esâtîr), fariskî “fesâne, efsane”, yunankî “mîtos, mît.”¹

Hîkayeyanê kilman ra vanê efsane. Babeta efsane yew şexsî, yew serebûtî yan zî yew cayî ser o bena. Ferqê efsane û sanike, çîyeko tewr muhîm o yo ke efsane de bawerî esta. Qalkerdişê efsane dime ra gerek merdim bawer bikero.²

Yê efsane goreyê babetanê xo çar beşê ci estê:

- a) Efsaneyê afirîyayîşî/afirîyayîşê cîhanî û peynîya ey
- b) Efsaneyê tarîxî

1 Elçin, Şükrü. *Halk Edebiyatına Giriş*. 1. Basım. Akçağ Yayınevi. Ankara. 1993. r. 314.

2 <http://www.millifolklor.com/PdfViewer.aspx?Sayi=13&Sayfa=33>.

Rola jinê di destanên kurdî yên epîk da

Ahmet Seyarî⁽¹⁾ ▶



(1) Xwendekarê doktorayê, li Zanîngeha Çewlîgê (Bîngol) Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.

Du meselokên

Farqînê

Roza Sîerra

1 Kuştina şêr

Rokî mêrikkî şêrekî dikuje. Mêrikkî pir jê-hatî bîye û şivan bîye. Jixwe şivanî kirîye, şêrekî ber wî de hatîye. Mêrik wî kuştîye û havêtîye ber derê gundekî. Gundî hemû li wir top dibin û dibêjin:

“Ûûû! Şêrekî way li va dera, nizanim kî kuştîye?”

Padîşah tê lê mêze dike û dibêje:

“Kî vî şêrî kuştîye? Kî bêje min vî şêrî kuştîye ez ê zêr bidim wan.”

Kî tê dibê weleh min kuştîye. Padîşah ji wan dipirse, dibê we çawa kuştîye? Her yek tişteki dibêje. Yek dibê min serî wî kir ber, yek dibê min nigê wî li hev lefand. Her yek bi awakî tişteki dibêjin. Padîşah li kî guhdarî dike, li wan bawer nabe. Dibê:

“Na, vana tev vir¹ in.”

Ewî mêrikê ku şêr kuştîye ji wê derê derbas dibe, mêze dike qelebalîxkî li wê derê top bîye. Dibê:

1 vir: derew.

“Çi bîye, mesele çi ye?”

Dibên:

“Weleh yekî li vê derê şêr kuştîye.”

Diçe dibê hela xwe bidin alî. Mêze dike û dibê:

“Wîûû! Vî şêrî min kuştîye ûûû...”

Padîşah dibêje:

“Te kuştîye, te çawa kuştîye?”

Dibê.

“Padîşahê min, weka ku tu ew heywanok bî û min ji kûçikê xwu yî belek ra got xwu berdê, xwu bavêjê û xwu avêt binê qirika wî û min wî girt, xeniqand, avêt wê derê.”

Îja padîşah bawer dike, dibê:

“Wele wî kuştîye..Yekî ku li qarşî padîşah wisa cesaretlî² be, bêje weleh padîşahê min weke ku tu ew heywanok bî û ji kûçikê xwe re bibê min berdayê, weleh vîya kuştîye.”

2 cesaretlî: wêrek.

Hin biwêjên

Devera Kercewsê

Hejar Dilbirîn-Yakûp Çelîk



Bêrîvan Matyar

Herêm: Gundê Çîçika/
Farqîn/Diyarbekir
Dîroka berhevkirinê:
23.08.2019

Hin nexweşî û dermanên nexweşîyan li gundê Çîçika

Ev xebata li ber destê we, xebateka berhevkariyê ye. Li gundê Çîçika hekîmek dijî û bi salan e bi hin metodan dermanan çêdike û nexweşîyan derman dike. Gelek kes tèn ber destê wê û li ser dermanên wê baş dibin. Min jî xwest ku navên nexweşîyan û dermanên wan nexweşîyan ji wê qeyd bikim. Min li deriyê vê hekîmê xist. Bi destûra wê min navên çend nexweşîyan û dermanên wan nexweşîyan nivîsîn. Hekîma me ji ber ku nexwest navê wê bê zanîn, min navê wê nenivîsî.

Navê nexweşiyê: Ta

Dermankirina wê: Wextê ku germa canê mirovî zêde dibe, dibêjin, “ketîye tayê.” Canê wan dikele, wekî sotikê agirî. Ji vê yekê ra dibêjin, ta girtîye. Îcar taya salawext jî heye, mirov hene ku salawext dikevin tayê. Salawext li erdê dimînin, ta digirin. Hin jî hene salê carekê dikevin tayê. Benikê tayê heye û heger benikê tayê li destê wan girê bidin, nexweş bi vî benikî baş dibin.

Qatqatîk

Xecê Bîşeng



Qatqatîk yan jî qatqatik, bi her du navan jî tê zanîn. Qatqatîk nanê birûn e. Pîranî di taştêyê da tê xwarin. Xwarineka malhazirî ye. Ji bo rêyên dûr jî tê çêkirin. Xwarineka meqbûl e. Qatqatîkê navê xwe ji qatên xwe yê pir girtîye.

Tiştên qatqatîk pê tê çêkirin

(ji bo heft kesan):

- Arvan: Tasek
- Xwê: Nivçengek
- Av: Qeysa hevîr pê nerm bibe
- Rûnê hişk:¹ Li gor lêçûnê

Çêkirina qatqatîkê:

Arvanê xwe tê xîr leganeka hinekî kûr û girover. Nivçengek xwêya xwe biavêjin ser û ava tînşikandî bera ser bidin û bi destan li hev bixînin, ku hevîrê we peşlûkî bû, destê xwe di avê dakin û hevîrê xwe biecînînin. Baş biecînînin û we dît hat qeysa ku bi tîrê vebe, bila ne hişk û ne jî nerm be, devê legana xwe bigirin. Text (textê ku hevîr bi tîrê li ser pehn dikin), tîr, kêr, arvan û rûnê dayînin bal xwe. Ne hewce ye hevîrê we hîlbê. Qatqatîk bi hevîrê şikeva tê çêkirin, lê hinekî bimîne jî tişt pê nayê, hevîr ku xwe hîltîne xweştir çêdibe. Hevîrê xwe bikin du girikên mezin. Rahêjin girikeka xwe û hinekî babidin û bikin wekî fitîleka stûr û dayînin ser textî, bi kêrê ji wê girika mezin girikên biçûk jê kin,

¹ Taybetîya qatqatîkê ya ku tehma wê xweş dike rûnê hişk e.

نفرین د حمیرانوکان دا



جمیل شیلازی